

Dumahîk: Avabûna ...

xalên balkêş tête nasîn:

1- Xwedî programeke siyasî, rêzname û sond e. Bi rêbaz û şeweyên demokratîk kar û xebata xwe bi rê ve dibe.

2- PYDKS li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê cîgirtî ye û xwedî piştgiriyeke civakî ye. Ji bilî rêxistinên partiyê, li bajarên mîna Şam, Heleb, Hesekê, Reqa, Til-ebyedê û li zanîngehan cîh digire. Bi ser de jî, hebûna rêxistinên heval û hogirên partiyê li bêtirî 13 welatên Awropî digel Siûdî Erebestan, Turkiyê, Libnan û Kurdistanê Îraqê...

3- Partiyê serbixwe, xwedî têkilî û dostanî ligel piraniya rewşenbîr, hêz û kesayetiyên siyasî yên Sûrî û Kurdistanê ye. Xwedî semboleke fermî û durîşma **"xebat ji bo aşî, azadî û wekhevîyê!"** ye. Doz û daxwaza partiyê, pêkanîna çareseriyê demokratîk bona pirsê netewî ya gelê Kurd li Sûriyê ye. Tund û tûjî, şeweyên çekdarî û xwînherikandinê napejirîne. Di wê baweriyê de ye ku, rîya herî rast bona çareserkirina hemî pirsan, rîya diyalog, gotûbêj û şeweyên aştiyane ye, da ku dijayetî û kîndarî kûrtir nebin, xizanî û nexweşî berfirehtir nebin, mafên mirovan û gelan di vê sedsala 21-an de bêne naskirin û binpê nebin.

4- Bona pirsgerêka Kurd li Sûriyê, parastina berjewendiyên pêvajoya civakî, aborî û zaniyarî di civak û herêmên Kurdî de û pêkanîna heyameke demokratîk li Sûriyê, PYDKS dibîne ku çareserî di pêkanîna cîbecîkirina daxwaza birêvebirîya xweser (Îdara Zatî) di çerçewa parastina yekîtîya Sûriyê de ye.

5- PYDKS xwedî kovareke mehane bi Erebi bi navê "El-wihde-Yekitî" û ya du mehane bi Kurdî bi navê NEWROZ e, digel piştgirî û lixwegirtina kovara PIRS ya demsalî bi Kurdî û kovara "El-hîwar-Diyalog" ya bi Erebi ya demsalî û ji sala 2006-an ve xwedî malper e: www.yekdem.com. Tevî ku ji hîngê ve, li Sûriyê

vekirina vê malperê qedexe ye û xwendevan nikarin rûpelên wê vekin.

- *Di derheqê bûyerên ku li Sûriyê diqewimin hûn dikarin bi giştî çi bibêjin? Partiya we qonaxê çawa dinirxîne? Di bingeha berxwedan û serhildana gelên Kurd û Erebi de çi heye?*

- Ji sala 1963-an de Partiya Baas bi baskên xwe yên cûrbecûr, bi navê 'şoreş'ê û berjewendiyên karker û cotkaran, Erebitî û sosyalîzmê û H.W.D desthilat û karbedest e û ji hîngê ve, rijîma dewleta Sûriyê di bin bandor û serkêşiya leşkerî de ye. Vêca di siha rijîma yek-partî de hemî rê û deriyên kedxwerî û malxweriyê vebûbûn, rê li pêş jiyana siyasî xetimî bû, karê partî û sendîqan, rewşenbîr û hunermendan, mafên bingeheke mirovan serûber dorpêçkirî û kambax bû... hwd. Eve 18 heyvin li piraniya herêm û derdorên bajar û bajarokên Sûriyê, karbedestên rijîma Baas xwepêşandanên gelêrî, bi tund û tûjiyêke bêhempa bersiva gelê Sûriyê dide. Ne tenê girtin û kuştin, lê belê bombabarankirina bi tanq û topan, bi balefir û hinde çekên giran, komkuji di derheqê mirovên sivil û bêguneh de, berfirehtir dibe. Vêca, li beramber vê yekê, rikberiya (mixalefet) çekdar jî têra xwe bi çalakiyan radibe, û bi alîkariya hinde hêz û dewletên derve, teşkilatên çekdar ên hinde baskên rikberiya Sûriyê, bi roleke germ radibin û bersiva rijîmê bi şeweyên germtir û hovane tête holê. Û xelkê sivil li ber lingan diçe û dibe qurban. Lewre, em dikarin bêjin, qonaxa ku îro Sûriyê dijî, berê wê xetimî û nediyar e. Ango ketiyê tariyê û bêguman rijîm di ber de berpirsiyar e.

- *Li Sûriyê krîza siyasî kûr dibe. Rijîma BAAS hîn di ber xwe dide, hêzên mixalîf û gelê Kurd jî ji bo guhertinê bi biryar in. Wê krîz çawa çareser bibe? Gelên Sûriyê bi dînamîkên xwe dikarin rijîmê birûxînin? Hedefeke wisa ya yekgirtî heye?*

Hêviya xelkê Sûriyê bi tevahî -çi Kurd û çi Erebi- ewe ku rijîma Baas **D.R. (7)**